


BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ★ Sal:6 Hejmar 3/87 (41)

www.kurdistan.org
Dinê dîsa bêdenge!



BERBANG

Organa Fedêrasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê
Organ för Kurdiska Riksförbundet

Berpirsyar / Ansvarigutgivare:

K. Izol

Serekredaktor / Chefredaktör:

R. Zilan

Redaksiyon / Redaktion:

M. Bekir, J. Kurdo, R. Simo, C. Hayderî

Karê teknîkî / Sättning och layout:

Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Navnîsan / Adress:

BOX 45205

104 30 Stockholm.

Telefon:

08/ 68 60 60

Postgiro:

64 38 80 — 8

Abonetî / Prenumeration:

Kes / Enskilda: 100 Skr. / sal/år

Meqam / Myndigheter: 200 Skr./sal/år

Aqahdarî / Annonc:

Rûpela paşîn / Baksîda: 2000 Skr.

Rupelên navîn / Insidor: 1000 Skr.

Nîvrûpel / Halva sidan: 500 Skr.

ISSN — 0281 — 5699

Redaksiyon ne berpirsyarê nivîsarên imze û axaftinên
Federasyonê ye. Nivîsarên ji Berbangê re tîn şandin,
heke çap ji nebin, li xwedî nayên vegeandin.

Bergê pêşîn:

Wêneyek ji Kurdistanê Irakê

Foto: Bobo Scheutz

Bergê paşîn:

Wêneyek ji Kurdistanê Irakê

Foto: Bobo Scheutz

Sal: 6 Hejmar 3/87 (41) 10.6.1987

NAVEROK

Kurdistan dê rojekê ji we re bibe goristan.....	3
R.Zilan	
Sirgûn û rom.....	4
Xelîl Xozan	
Ji navên me ditirsîn.....	6
S.Ferman	
Civîna Meclîsa biyaniyan.....	7
Mamosteyên Kurd dîplome girtin.....	8
Mamostetiya Kurdî	
Xoşmend Baran	10
Dermanê kêça.....	11
Brîndar	
Hefta dostaniyê.....	12
Xebata Federasyonê ya sê mehên piştî Kongra 7-em.	13
Kutana sing.....	16
Hesenê Metê	
Di girtîgeha Diyarbekrê de II.....	17
Keleş	
Bazgerdanî.....	20
Zerê Ûsib	
Jiyani pêşmergeyê Kurdistanî.....	23
Raportî Fiderasyonî Komeley Kurdistan.....	27

Xwendevanên heja,

Bi vê hejmarê Berbangê du hevkarên nuh di karûbarê redaksiyonê de beşdar dibin. Yek ji wan heval Cemşîd Heyderî, li ser daxwaza Komîta Giştî ya Federasyonê di redaksiyona Berbangê de cî digre û heval Bavê Rojbînê jî di redaksiyona teknîkî de beşdar dibe.

Di hejmara Berbangê ya 2/87-an de, herweha di yên din de jî, gelek şaşî û çewtiyên rêzmanî, rastnivîsîn û çapê hatine kirin. Rexneyên ku di vî warî de li me hatine girtin, em wan di cîh de dibînin. Biborin. . . Em ê hewil bidin da ku ji vir û ha de, di hejmarên pêşerojê de, şaşiyên weha nehêne kirin.

Ji xwendevanên me gelek caran rexne tîn û dibêjin ku di Berbangê de bi zaravayê kurmanciya jêrîn nivîsar kêr tîn weşandin. Ev rexne di cîhê xwe de ye. Lê divê hevalên ku bi vî zaravayî dikarin binivîsin, jî bo kavara me binivîsin û nivîsarên xwe ji me re bişînin.

Heta hejmareke din saxî û xweşiya we dixwazin û hêvî dikin ku hûn havîneke baş û serkeftî derbas bikin.

KURDISTAN DÊ ROJEKÊ JI WE RE BIBE GORISTAN

R. Zilan

Va ye Kurdistanê Îraqê careke din bûye armanca kampanya nehîştin, çolkirin û vebirînê. Rejîma hov û faşîst ya Seddam, bi zora çu û singoyê, çareserkirina pîrsa Kurdî ji xwe re kiriye nav programa karûbarên acîl. Ji lewre jî dest pê kiriye gund û bajarên Kurdistanê başûr vala û çol dike. Xelq û şênîyên wê, bi bahana şer dide ber çekên kîmyayî.

Heçî li hember xelqê sîvîl bikaranîna çekên kîmyayî ye, ji bo Kurdistanê başûr û gelê me ne tiştêkî nû ye. Bi taybetî ji sala 1961 an û bi vir de, rejîmên têvel yên xwînxwar li hember xelqê sîvîl yên Kurdistanê başûr gelek caran çekên kîmyayî bi kar anîne. Vebirîn û qetlîamên mezin li dar xistine. Bi vî awayî xwastine, ku çavên gel bitirsînin û li milekî din jî, pişt tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd bidin erdê. Helbet doz û kêrta bikaranîna çekên kîmyayî li gor zemanan hatine guhartin. Ew carina kêr û carina jî yekcar zêde hatine bi kar anîn. Bi taybetî di sala 1974-an de bikaranîna çekên kîmyayî gihabû kêrteke bilind. Wê çaxê jî, weke îro, cîhanê guhên xwe girtibûn, hawar û gaziyên Kurdan nedibihîstin(!).

Herwekî eşkere ye, bikaranîna çekên kîmyayî bi peymanên navneteweyî ve hatine qedexe kirin. Piraniya dewletan jî ev peyman îmze kirine, peyman dane ku çekên kîmyayî bi kar nehênin. Lê çî hîkmet e, ku heya niha jî tu dewleteke tawanbar, ji ber bikaranîna çekên kîmyayî li hember xelqê sîvîl, nehatiye mehkûm kirin. Heta gelek caran tevgerên neveteweyî bi tirs çûne ser wan, newêrîne wan ji ber kir û kirdarên holê riswa bikin.

Em niha dibînin, ku li awira giştî ya cîhanê de meyleke xurt ji bo bi temamî qedexekirina çekên kîmyayî heye. Bi taybetî hêzên aşîxwaz û

demokrat dixwazin ku çekirina çekên kîmyayî jî bîr qedexe kirin. Bê guman ne bi tenê em Kurd, lê mirovahî bi giştî divê dozkarê vî tiştî be. Lê divê beyan bikin, ku baweriya me, qîm û qenaeta me ji îmzeyên dewletên kolonyalîst û kevneperest re tune ne. Ji ber ku ew her kevneşop in, ji mirovahiyê dûr û bi her tiştê xwe ve çepel in. Peymanên holê îmzekirina wan, ji bo propogandekirinê pê ve, ne çu tiştê e. Weke ku xuya jî bûye, peymanên wisan li ba dewletên holê bîrx û bêqiyet in. Bo nimûne, Tirkiyê bi sedan peymanên wilo yên navneteweyî îmze kirine. Lê ka kîjan ji wan bi rastî dihên bi cîh anîn? Rêzdarî û hurmeta kîjan ji wan dihêne girtin? Vêca eger rejîma Bexdayê ev rejîm û ya vî Seddamî be, nîrx û bihayê mirovahiyê li ba vî rejîmê hinde be, nav û mana qedexebûnê jî **SERBESTBÛN** e. . .

Heçî vala û çolkirina Kurdistanê başûr e, ev jî ne cara yekemîn e ku Beesiyên har tiştêkî weha li dor dixin. Bi taybetî rejîma faşîst di van 15 salên dawîn de pêkhatina etnîk û demografîk ya Kurdistanê ji binî de guhart û têkda. Wê cara pêşin bi xurtî dest avêt guhartina pêkhatina etnîk û demografîk ya bajarê bi taybetî Kerkûkê û bi giştî jî Mendelî, Xaneqîn, Şengal, Mûsil û hwd. Bi temamî erebkirina wan bajarên ji bo piştqayîmiya xwe ya nemaze aborî garantiyek didît. Ne bi tenê ev, lê şikandina pişt tevgera rizgarîxwaziya Kurdan jî jê re armanca herî mezin û girîng bû.

Rejîma hov û faşîst ji tecrubên kolonyalîstên weke Portugalê û Emperyalîstên weke Amerîkayê jî dersine mezin wergirtibû. Baş dizanibû ku da piştê li tevgera rizgarîxwaziya Kurdan bide şikandin, divê wê ji gel bide îzole kirin. Ji ber ku destbîrakên wê li Mozambîk, Angola û

Vietnamê bi vî riyê gelek deskeftî û mewziyên girîng bi dest xistibûn. Ji ber vî yekê ye, ku rejîma faşîst da ku tevgera rizgarîxwaziya Kurdan bi ser nekeve û da ku Kurdistan ji destan dernekeve, giraniya xwe daye ser vala û çolkirina Kurdistanê.

Ji meha nîsanê û bi vir de, rejîma Seddam bi xurtî dest bi vala û çolkirina navçeyên bi wîlayetên Kurdî ve girêdayî, yên wek Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr û Dihokê herweha navçeyên Kurdî yên ku bi îdarî bi wîlayetên Nînova, Diyala û Selahedîne ve girêdayî ne, kiriye. Heta niha jî Silêmaniyê 3546 km² ji Hewlêrê 2899 km², ji Kerkûkê 3083 km² û ji Dihokê 4122 km² erd hatine vala kirin. Herwisan li van wîlayetên han jî ji sedî 50-yê erdên gundan hatine çol kirin: Li Silêmaniyê 2684 km², li Hewlêrê 4349 km², Li qeza Qadir-Keremê ya wîlayeta Selahedînê 1450 km², li Dihok û Nînovayê 1304 km² ji bilî van, ji bo çolkirina li Hewlêrê 4560 km², li qeza Kufriyê ya wîlayeta Diyalayê 2200 km² erd, ferman hatiye derxistin. Ango heta niha 23 437 km² erd ji şênî û rûniştevanên xwe hatine vala kirin. Avahî û bajarvaniya wan deveran hatine kavi û wêran kirin. Di demeke kurt de jî dê 6760 km² erd ji şênî û rûniştevanên xwe bîr vala û çol kirin. Herweha dê avahî û bajarvaniya wan deveran jî bîr kavi kirin û bi erdê re bibin yek. Kurdistan careke din bi destê dijmin dibe agiristan. Roj tune ye, ku lê kavi û wêrankirin, vebirîn û kuştin, vala û çolkirin nehên li dar xistin. Roj tune ye, ku dijmin lê hovîti û dirindetiya xwe, harî û çavSORIYA xwe, xwînrêjî û xwînxwariya xwe nîşan nede û nenimîne. . . Ev trajediyê gelekî mezin e. Ev ji mirovahiya di sedsala 20-an de rûreşiyê gelekî mezin e.

SIRGÛN Û ROM

Xelil Xozan

Di sala 1925-an de, pey serhildana Şex Seîd, li ser navê "Takrîr-î Sukûn" qanûnek hate li dar xistin. Bi vê qanûnê ve, li dijî serhildana gelê Kurd, ne tenê tedbîrên eskerî û îdarî, wisan jî, di Kurdistanê de dewleta Tirk xwe ji nû ve reorganîze jî kir. Wek di dewra Osmaniyan de kesên li dijî otorîta dewletê rawestîn, bi destê zorê ji welatê xwe dihatin derxistin û sirgûn- kirinê, niha ji aliyê Komara Tirkiyê ya nû de jî ev metod û siyaseta dî bihata domandin.

Lê belê bi serhildana Şex Seîd ve, di dîroka milletê Kurd de rûpeleke nû vedibû. Her çiqasî di navbeyna despêka Serhildanê û şikestina wê de sed roj, wek demeke kurt derbas bûye jî, bê gotin tesîra serhildanê û netîcên wê yên civakî û siyasî xwe bi salan ser civata Tirkan û Kurdan nişan dane.

Her çiqasî Komara Tirkiyê li ser hîmê împaratoriya Osmaniyan, bi raman û baweriyeyeke nû ve hatibû damezrandinê jî, lê nayê înkarkirinê ku Komara Tirki- yê zêdetirîn despot û nijadperest bû. Îdeolojiya dewletê, li ser esasê "yek millet-yek doktrîn-yek nijadî" hatibû li dar xistin. Ev îdeoloji berdewama Îttîhad û Teraqîyê bû. Ev şîarên nijadperest wê demê ne bi tenê ji aliyê komara Tirkan de, wisan jî li Îtalyayê ji aliyê Musolînî û li Almaniyayê jî ji aliyê Hîtler ve dihatin avêtinê. Ev yek wek ewrekî reş, dê li ser gelê dinê dûr û dirêj bigeriya.

Di sala 1925-an de ne tenê ji bo gelê Kurd herwisan ji bo gelê Tirk jî bû sedema rojên reş. Li pey qanûna "Takrîr-î Sukûn" bi deh hezaran Kurd, ji welatê xwe bi destê zorê hatin derxistin û sirgûnî Anadolîyê bûn. Di riyan de bi hezaran kes, tî û birçî, di nav êş û janê de mirin. Di ser ronakbîr û çepên Tirkan de jî teroreke bê

hempa hat ajotin. Rojname, sendîka û komelên wan hemû hatin girtin. Berê bi hezaran kesên wan dan girtîxanan. "Bê dengiyek" ji aliyê komara Mistefa Kemal de hat amade kirin.

Ev tedbîrên zerûfî paşê bûn sedemên lêkolînên "îlmî". Siyasetzan û "alimên" Komara Tirkiyê, serê xwe li ser fetisandin û rakirina milletan êşandin. Ew gihîştin baweriyekê, ku tedbîrên ku tên wergirtin, divê nebin sedemên opozîsyonên nû. Li dî karekî dîr û dirêj, di sala 1934-an de, Qanûna Sirgûnê ya hejmar 2510 hat derxistin. Li gor vê qanûnê "Kesên ku zimanê wan yê zikmakî ne tirkî bin, gerek pêşî li zêdebûna nifûsa wan bîn girtin. Ew kes pêwîst e di nav grûbên Tirkan de bîn belav kirin û bîn helandin, navê milletê wan ji holê bê hildan. Herwisan jî di bendên vê qanûnî de, ji bo helkirina vê pirsê bawerîya dewletê vekirî dihat eşkere kirin. Mîna ku di benda 9-an de tê gotin: "Kesên ku ne giredayî çanda Tirkan bin, gerek ew grûp bîn perçe kirin, rivd bi rivd û bir bi bir, bîn tar û mar kirin".

Di benda 10-an de "Eşîrên ku ne di bin hîmaya Tirkan de bin, gerek hemû wek perçên piçûk di nav nifûsa Tirkan de bîn belav kirin" Di benda 13-an de "Kesên ku milliyeta wan ne Tirk bin, gerek li gor vê qanûnê nifûsa wan bîn perçe kirin û di nav nifûsa Tirkan de bîn helandin û peywendiyên wan ji hevûdu bîn qut kirin"

Komara Tirkiyê û îdeolojiya wê kemalîzm, li dijî tekoşîna gelê Kurd hertim bi wan metodan ve rawestîyaye. Gelê Kurd her kîngê, ji bo hilweşandina serdariya kolonyalîstan serê xwe rakiribe, wan sirgûn di gel kuştinê hazir û nazir kirine. Bi tenê di navbera salên 1925 û 1983-an de 13

caran Qanûnên Sirgûnê hatine derxistin.

Bi sirgûna dawiyê, herwekî ku tê zanîn di sala 1961-î de 485 kesên Kurd şeş mehan li Sêwasê û di kampekê de hatin tecrît kirin û di dawiyê de di nav wan de 55 kes hatibûn sirgûn kirin. Îro jî em dibînin, ku dewleta Tirkiyê ya ku bi serê Mistefa Kemal sond dixwe, dixwaze careke din gelê Kurd ji welatê wî derbixin û sirgûnî nav heremên Anadolîyê bikin.

Lê belê dewleta Tirkiyê vê carê wek salên 1925 û 1934-an napeyive. Ew li ser sedemên sirgûna nû bi tewreke din diaxivin. "Di vê qanûnê de tu armanceke siyasî tune ye. Ev yek bi tenê ji bo daxwaz û rihetîya millet pêk tê."

Ya rastî, ev gotin û kirin jî diyar dikin, ku rûyê dewleta Tirkan ne rûyê şermê ye. Dek-dolab û demagojî karekterê vê dewletê ye. Kê dîtiye, kê bihîstiye, ku mirov bi destê xwe mala xwe wêran bike, welatê xwe, axa xwe terk bike û here ser erdekî zik û ziya.

Di raman û bawerîya tu gelfê de tiştekî bi vî awayî nehatiye dîtin. Îro li çar aliyên dinê, gelên ku bi destê zorê ji welatên xwe hatine derxistin û dîrxistin, ji bo vegera ser welatê xwe bêwestan şer dikin.

Gelê Kurd, 2000 sal in ku li ser axa xwe dijî. Gelo ji bo çî bi kêmanî ev 200 sal in ku ji bo azadî û rizgariya welatê xwe şer dike? Demagojiya faşîstên Tirkan, ji bilî xwe, tu kesî nikare qanîh bike. .

Di sala 1985-an de gelek kes ji herema Dêrsimê hatin sirgûn kirin. Yek ji wan jî Huseyîn Koç yê 80 salî ye. Koç, ji bo sirgûna nû dibêje, ku "Ez di sala 1938-an de jî hatibûm sirgûn kirin. Wê çaxê em şandibûn Adapazarîyê. Di sala 1985-an de şevêkê cendirman di ser gundê me de girtin û gotin hûn gerek di şevêkê de vî gundî

vala bikin û van diyaran terk bikin. Em niha hatine Akhîsarê û di garajan de pal didin. Em tî û birçî ne. Lê belê sirgûna 1938-an ji ya îro çêtirbû."

Disan gundiye Dersimê yê ji gundên Turjî, Durnikes, Gestek, Derekoy û Osmaniye, ku bi zora qundax û singoyên leşkerên Tirkiyê ji gundên xwe hatine derxistin, dibêjin: "Hukûmeta Tirkiyê niha dibêje, ku em ê van hereman bikin bax û baxçe û park. Madem ku armanca we ev bû, ji bo çî we ji 1980-î bi vir de, şev û roj hemû bax û baxçên me birin û şewitandin." Bi tenê ev yek nişan dide ku dewleta Tirkiyê li pey dek û dolabên nû ye.

Niha, da ku şeniyên Dersim, Bingol, Mûş û yê Qersê welatê xwe terk bikin, bi zora singoyan blanketan bi wan didin îmza kirin. Kesên ku naxwazin wan blanketan îmza bikin, bi rojan di bin îşkencan de tîn zêrandin. Niha şeniyên van herêman di bin tehdîdeke dijwar de ne. Teda û zilma dewletê li ser gel deh qat zêde bûye. Ji gundiyan re eşkere tê gotin, ku "Yên ku dixwazin li vir bimînin, dê halê wan her roj ev be." Gundî di nav du agir de, di navbera mirin yan jî sirgûnê de, mane.

Gundiye ku sirgûnî Anadolîyê dibin, mercên jiyane yê bingehîn qet tune ne. Ji bilî perîşanî, bêkarî, birçîbûn û tedayê tu tiştekî din nabe para wan.

Gelek rojname û kovarên tirkî, yê ku li Tirkiyê tîn çap kirin, pûte û sexbîriyê didin pîrsa sirgûnê. Bi gelek kesên ku tîn û hatine sirgûnkirinê re, li ser pîrsa sirgûnê hevpeyvîn hatine çêkirin. Ew bi dengê xurt "Em naxwazin welatê xwe û axa xwe terk bikin".

Pêwîst e, bûyerên berê û herweha yê ku niha qewimîne, bi awakî siyasî

û civakî bîn analîz kirin. Sirgûna Êrmenîyan, ya sala 1915-an, vebirneke mezin anîbû serê wan. Rast e, ku mercên îro ne wek yê duh in. ew raste. Lê siyaseta dewleta Romê (Tirkan) ya li dijî gelên din, wek ya duh e.

Îro, pîrsa gelê Kurd hema hema her roj di merkezên siyasî yê dinê de tîn muzakere kirin. Herweha li Tirkiyê jî cara yekemîn e, ku pîrsa Kurdan hinde aktuel bûye. Rast, çep, faşist, lîberal, demokrat hemû dîtinên xwe li ser vê pîrsê, wek "Pîrsa Kurdan" eşkere dikin. Bê guman di gel sedemên wê yê siyasî û civakî, konjuktura Rojhilata Navîn jî roleke taybetî dileyze. Îro hin merkezên siyasî xwe zêdetir nêzîkî vê pîrsê dikin. Ji ber ku pîrsa gelê Kurd ne bi tenê gelê Kurd yan jî welatên kolonyalist eleqedar dike. Lê belê ew hin merkezên siyasî yê ku menfaetên wan jî gelek aliyan de tîn tehdît kirin jî eleqedar dike. Ji lewre jî ew dixwazin xwe di vî warî de bikin xudanê "dîtineke resmî". Em dikarin bêjin ku pîrsa Kurdistanê ya siyasî û aborî, li pey şerê dinê yê yekemîn, cara duhemîn e ku bi vî awayî dibe pîrseke navnetewî. Statuya ku dijmin û emperyalîstan dane Kurdistanê, careke din di nav wan bi xwe de, da ku riya hilweşandina serdariya kolonyalîstan û hevalbendên wan bê girtin, tê munaqêşe kirin.

Îro li Tirkiyê gelek siyasetzan û nivîskar li ser pîrsa kurdî û ji bo planên nû, dîtinên xwe bê sansur dinivîsin. Ev kes li ser du dîtin û planan radiwestin. Di dawiyê de, herdu alî jî aqilbendiya bûrjûvaziyê karbidest dikin. Yê ku xwe lîberal "demokrat" dihesibînin, di dîtinên xwe de nişan didin û dibêjin "Em ji 1800-î û bi vir de eynî metodî bi kar tînin, lê belê tenê bi kuştin û zorê ev pîrs nayê helkîrin. Ev yek neçû sêrî. Li

hember van bûyeran daxwaz û şerê azadiyê her ku çû gur û bilindtir bû. Di gel vê yekê jî, dubendî û dijayetiya ku li mintiqê û dinê heyî, dikare ji bo Kurdan firsendekê jî biafirîne. Kurd jî êdî ne Kurdên 1925-an û ne jî yê 1938-an in. Îro Kurd di warê siyasî û diplomasiyê de her ku diçin gavên pêşdetir diavêjin, û herweha gelek kes guhdariya wan jî dikin. Ya baştirîn ev e ku em çareke aborî û çandî bibînin."

Ya rastî ev kes wek însanên demokrat nafîkîrin. Wan tu caran qelemên xwe li hemberî zor û zulma li ser gelê Kurd bi kar neanîne. Ew, îro da ku bûrjûvazî nakeve astengên mezin, dixwazin rê û rêçan nişanî wan bidin.

Ji aliye din de jî yê ku bi faşîzm û mîlîtarîzmê ve girêdayî ne, dibêjin ku "Îro di Rojhilata Navîn de xetereke mezin peyda dibe. Şerê Îraq û Îranê digihêje gehînekeke xerab. Kurdên Îraqê nêzîkî rizgariya xwe dibin. Eger peşiya vî tiştî neyê girtin, dê ev yek ji bo dewleta me, ji bo Amerikayê û herweha ji bo Natoyê jî bûye xetereke mezin. Ev yek ji bo ekonomîya me jî bûye firsendekê dîrokî. Bidestxistina Kerkûk û Mûsulê ji bo stabilîzekirina Tirkiyê tiştekî bêhempa ye. Zû bikin û bilezînin, vê yekê ji dest nerevînin."

Ev grûpên han jî, her roj ji bo vegirtin (îstîla) û vebirînen (qetlîamên) nû, hespên xwe bi zîn û zengî dikin. Yan Kurdistan! Yan Yûnan!

Bê guman, di rojên pêş de, dê pîrsa Kurdistanê zêdetir aktuel be. Ji bo "helkîrina" pîrsê dê gelek merkez serên xwe li ser planên xwe yê nû biêşînin. Gerek gelê Kurd her tim û her gav ji van rojên dijwar re amade be.

Dirok ji bo van rojên pêş rûpelên xwe yê nû vedike.

Hukûmeta Iraqê hate protesto kirin

Komîta Hevkariya Rêxistinên Kurdistanê yê Siyasî Li Swêdê di roja 28-ê gulanê de li dijî rêjîma faşîst ya baas ku li Kurdistanê Başûr destpêkiriye û çêkên kîmyewî bi kar tîne, meşeke protestoyê pêk anîn. Di meşê de dora 800 kesî beşdar bûn û bi hev re dengê xwe li dijî kirinên rêjîma

faşîst bilind kirin.

Komîta Hevkariyê, bi namekî Federasyona me ji meşê agehdar kir. Komîta Kargêr ya Federasyonê jî hemû komelên xwe yê endam bangê meşê kir û xwest ku bi xurtî di meşê de beşdar bibin. Federasyonê di meşê de bi xurtî cîhê xwe girt.

AGEHDARÎ

Nivîskarê kurd Bavê Nazê di roja 27-ê hezîranê de wê li ser çîrokên kurdî semîna rekî bide. Hemû kes bi xêr werin.

Cîh: Medborgarhuset, samlingssal 301. Saet: 14.00.

JI NAVÊN ME DITIRSIN

S. Ferman

Komara Tirkîyê, ku li ser bingeha îdeolojîya neteweperestî û nijadperestiyê hatîye ava kirin, ne tenê bi inkarkirina gelê Kurd maye, lê bingeha hemû ziman û mijadan jî bi koka tirki ve girê daye.

Wek tê zanîn, hîmdarê vê komarê M. Kemal, berî avakirina Komara Tirkîyê, bi zimanekî din diaxîfî. Bê şik di dema şer de jî, durûtiya wî xuya bû. Wî baş dizanibû, ku bê alîkariya Kurdan ew nikare li hember dewletên xurt raweste. Ji bo ku karibe piştîgiriya Kurdan bigre, wî mafê Kurdan jî, weke me got, bi durûtiya be jî mecbûr qebûl kir. M. Kemal dixwest ku Kurdan û Tirkan bîne cem hev û wekî miletekî "misilman", ango "yek millet" nîşan bide. Bi vê awayî jî wî dikarî niyeta xwe ya bingehîn li ser Kurdan veşere. M. Kemal bi hostatî jî rewşa Kurdên dewlemend û xwedî nîfûz îstifade kir û bingeha şerê rêxistinî li Kurdistanê dani.

Piştî serketina M. Kemal, navê Kurd û Kurdistanê hat qedexa kirin.

navên bajar û gundan hatin guhartin, periyodek gelek reş û tarî dest pêkir. Û em dizanin, ku di pey re gelek serhildanên Kurdan li dijî vê bêbextî û hovitiyê pêk hatin, gelek Kurd jî bi hovîti hatin kuştin.

Bê şik guhertina nava, bi taybetî jî navên gundan, di praktîkê de li gora dilê dijmin netîce neda. Navên gundan yê Tirkî di "resmîyetê" de, li ser kaxiz ma. Kurd hê jî navên gundan xwe bi Kurdî dibêjin. Em gelek serbilind in, ku ne navê Kurd û Kurdistanê, ne jî navên cihên me jî bîr bûne. Lê Kurd gelek hatin êşandin û ji bo parastina hebûna xwe îro jî gelek tîr êşandin. Bi xurthûna tevgera welatparêzî re tade û zulma li ser gelê Kurd jî hatin geş kirin.

Bi taybetî piştî sala 1974-an tevgera gelê Kurd gelek pêş de çû û hisyarbûneke mezin di warê welatparêzî û civakî de pêk hat. Piştî vê salê jî sereşger û welatparêzên Kurd navên kurdî li zarokên xwe kirin. Vê yekê tirsê mezin xist dilê dijminên Kurd.

Dijminên me, bi hatina cunta faşîst di sala 1980-î de, bi hovîti dixwazin vê peşdeçûnê paş de vegerin. Bi zora mehkeman navên kurdî tîr guhertin.

Yek ji van hovîtiyan, berê çendekê li bajarê Bedlîsê jî qewimî. Serek-polîsê Bedlîsê raporeke bi navê "Navên Kurdî" hazîr kir, nerehetî û gazinên xwe tê de dane kifşê. Ew di rapore de dibêje, ku "Kesên van deran rûçikên xwe yê heremî hê jî diparêzin. Ew bi zimanê xwe diaxfin û navên kurdî li zarokên xwe dikin."

Bi sedema vê rapore di derheqê 12 kesan de bi armanca guhertina navên kurdî mehkeme vekirin. Li angorî merciyên resmî ku bi vê pîrse mijul dibin, navên kurdî wek "Roja Welat" û "Rojbin" li dijî "kultura millî û exlaqîyê" ne û divê ew nav bîne guhartinê.

Belê, şovenîst bi van tespîtên xwe yê "mîllî û exlaqî" navên kurdî wek "Zozan"ê dikin "Suzan". Lê ew bêexlaq baş dizanin ku "Suzan" di zimanên ewrûpî de navê keçan e. Lê wisa xuya dîke ku "birayên me yê misilman" jî navên "bîexlaq" û "xirîstiyanan" natirsîn; tirsê wan jî mayîna qelê me û hebûna me ye.

CIVÎNA BARSELONA YÊ

Enstîtûta Kurdî ya Parîsê di navbera rojên 18-24/4 an de li Barselona yê, li paytexta Katalonyaya otonom, civînek li dar xist. Ew civîna xebata hefteyekî ya beşa ziman û edebiyatê bû. Di civînê de di gel serekê Enstîtûtê K. Nezan, ji welatên cihê cihê yê Ewrûpayê jî ev heval amade bûn; X. Abdullah, M. Baksî, R. Barnas, D. Ferho, Huner, M. Kewal, F. Şakelî, M. Uzun û R. Zilan

Civînê, bi dirêjahiya xebata xwe, li ser çend pirsgerêkên girîng gotûbêjin kir û ji bo çareserkirina wan xebatî. Di nav van pirsgerêkan de; tespîtkirina navên mehan, rastnivîsîna navên rojên heftê, demên salê, hejmaran, hin peyvên latînî/ navneteweyî cihê berbiçav werdigirtin. Herweha di rojpergala civînê de çend deqên din yê girîng jî hebûn, ku diviya civînê li ser kar bikira û ew bigihanda dongiyekê. Ji wan; xebata li ser du

nexşeyan, nexşeya Kurdistanê û ya cihanê xebatin taybetî diviyan. Civînê, di vî warî de, hin peyvên coxrafîk û ji bo nexşa cihanê jî rastnivîsîna navên welat, paytext, bajar, çiya, çem, derya (zerya) û qitayên cihanê û hwd. li gor bilêvkrina kurdî tespît kirin. Herwisa jî bo nexşa Kurdistanê jî navên bajarên Kurdistanê û rastnivîsîna wan tespît kirin. Di gel vê jî, çar grûpên xebatê, ji her perçeke Kurdistanê re yek, pêk anî da ku ew di maweyeke kurt de li navên bajar û bajarokan bikolin, hejmara rûniştvanên wan derbixînin. Civînê, ji bo domandina karê xwe, biryar li ser civîna payîzê jî da û ji bo wê programmeke berbiçav danî. Heçî netîce û encamên civînê ne, dê piştî jî aliyê Enstîtûtê ve bîr daxuyanî kirin.

Beşdarên civînê mevanên resmî yê hukûmeta otonom (Generalîtet) ya Katalonyayê bûn. Ji lewre jî ew ji ali-

yê hukûmeta otonom ve bûn vexwendiyên serayê. Serekwezîrê hukûmeta otonom beşdarên civînê qebûlî serayê kir. Piştî bixêrhatineke germ, axaftinek kir. Wî di axaftina xwe de, bi kurtebirî behsa tofan û boblatên ku faşîzma Franko di wan 40 salên de anîbûn serê Katalonyayê û qedexekirin, bi awakî sistematîk piştaftin û asimilasyona zimanê katalanî kir. Her wisa behsa ji asimilasyonê rizgarkirina ziman û çanda katalanî, wek zimanekî xwendin û nivîsandinê xwenûjenkirina katalanî jî kir û di vî warî de rewşa zimanê xwe û xebata ji bo vejandina zimanê kurdî dan ber hev. Wî di axaftina xwe de beyan kir, ku bi tenê gelên weke katalanî dikarin rewş, dijwarî û rojên reş yê ku Kurd tê de dijîn tîbigihên. Bizanibin ku bi dilekî germ piştîmêniya şerê azadîxwîziya gelê Kurd çendî pêwîst e û çendî ji karê mirovatiyê ye. . .

Civîna Meclîsa Biyaniyan

Meclîsa Biyaniyan, di bin serokatiya wezîrê biyaniyan Georgê Andersson de, ji berpirsyarên federasyonên biyaniyan pêk tê.

Di salekî de sê-çar caran dicive û li ser pirsên biyaniyan yê rojane disekine. Rêxistinên biyaniyan daxwaz û dîtînen xwe di van civînan de pêşkêşî hukûmeta Swêdê dike. Herweha hukûmeta Swêdê jî, dîtînen rêxistinên biyanî li ser polîtîka xwe ya biyaniyan digre.

Carna jî, ew meclîs ji sê-çar salan carekî tevî rêxistin û meqamên Swêdê dicive û li ser pirsên girîng yê biyaniyan disekine.

Îsal di 22-23-ê gulanê de, Meclîsa Biyaniyan civîna xwe ya xebatê li bajarê wezîrê biyaniyan Georgê Andersson, Lycksele, bi 103 nûneran; nûnerên federasyonên biyanî, rêxistinên swêdî û meqamên Swêdê li dar xist. Civînê li ser ev her sê pirsên girîng munaqêşe kir.

Beşdarbûna biyaniyan di prosesa demokratîk de:

1- Meriv çawa dikare bi hevra berpirsariyê bigre ji bo ku statuya pirsên biyaniyan bête bilind kirin? Hempayên diyar û nediyar.

2- Beşdarbûna biyaniyan di karûba-



rên belediyeyî û dewletî de çawa dikare fireh bibe? Hempayên diyar û nediyar.

3- Biyanî çawa dikarin di rêxistinên civakî de xwedî giranî bibin. Hempayên diyar û nediyar.

Pirsên nesla duhemîn:

1- Meriv çawa dikare şexsiyeta û rewşa ciwanên biyanî di civata Swêdê de bi hevkarîya ciwanên swêdî xurtir bike.

2- Meriv çawa dikare îmkanên baştir bide ciwanên biyanî ku karibin bi hêsani di bazara kar de kar bigrin.

3- Civata Swêdê çawa dikare ji îmkanên nesla duhemîn fêde bibîne; wekî ji tecrubeyên wan yê kulturî û ji duzimanbûna wan?

Pirsên teqawidên biyanî:

1- Di derbarê rewşa teqawidên biyanî em çi dizanin?

2- Meriv çawa dikare ku ji îmkanên teqawidên biyaniyan fêde bibîne?

3- Meriv çi dikare bike ku teqawidên biyanî ji tenêmayîne rizgar bike?

4- Meriv çawa dikare di warê nezaniyê zimanê swêdî de alfkariya teqawidên biyanî bike?

5- Ji bo ku ferqa di nav neslan de bête rakirin, çi pêwîst e?

Munaqêşa her pirsêkî bi axaftina nûnerên rêxistinên biyanî û meqamên Swêdê dest pê kir. Herweha her pirs di grûpên xebatêde hatin munaqêşe kirin û her grûpekî li ser pirsan pêşniyarên konkret di roja dawî de pêşkêşî civînê kirin.

Di jimareke dinê de emê cîh bidin pêşniyaran.



MAMOSTEYÊN KURD

DÎPLOME GIRTIN

Di Xwendegeha Bilind ya Mamostetiye de, xwendekarên beşa kurdî diplomeyên xwe girtin. Ev grûpa duhemîn e ku beşa kurdî di Xwendegeha Bilind ya Mamostetiye de xilas dikin. Roja ku xwendekarên kurdî diplomeyên xwe girtin, 7.6.1987, grûpek ji wan li gel mamosteyê xwe Reşo Zilan serdana Federasyonê kirin û bi dilşadiyekî mezin diplomeyên xwe nîşani herpirsyanê Federasyonê dan. Me ji ew ji dil û can pîroz kirin û ew pirsên jêrin ji bo xwendevanên Berbangê kirin.

Kek Reşo, ev sala duduyan e ku xwendekarên Kurd diplomeyên mamostetiya kurdî werdigrin. Bê guman ev yeka ha karekî gelekî hêja ye. Tu ji kerama xwe re dikarî, wek mamosteyê beşa kurdî ya Xwendegeha Bilind ya Mamostetiye ji bo xwendevanên Berbangê behsa karûbarên beşa kurdî bikî?

-Herwekî hûn jî dizanin, bi biryara demûdezhêhen dewleta Swêdê, di sala 1984 an de, di Xwendegeha Bilind ya Mamostetiye de beşa Kurdî vebû. Vebûna beşa kurdî şahiyê mezin xist dilên Kurdên bi taybetî yên li Swêdê û bi giştî jî yên li derveyî welêt. Ji ber ku di dîroka gelê Kurd de ev yekemîn car bû ku dewleteke dereke ji bo perwerdekirina mamostên zimanê zikmakî yên Kurd projekte berbiçav dabû ber xwe. Ev, di alîkî de ji bo nasîna mafên bingehîn yên demokratîk û mirovatî yên Kurdan û li alîkî din jî, li dijî siyaseta pişaftin û asimilasyonê sistematîk ya rejîmên kolonyalist û paşverû qewmandin û bûyereke gelekî girîng bû. Ev pêşdehatina, ji gişt aliyên ve, ji bo Kurdan û ji bo parastina heyînen neteweyî yên gelê Kurd destkeft û mewziyê gelekî hêja bû.

Çi di sala destpêkî de be û çî jî îsal be, me dît û em dibînin, ku di nav Kurdan Swêdê de ji bo di vê xwendegehê de xwendinê hez û hewesê



UTBILDNINGSBEVIS HEMSPRÅKSLÄRARLINJEN

Datum: 1987-06-04

Hemspråk: kurdiska

Immigrant language: kurdish

Examensbenämning: Högskoleexamen på hemspråkslärarinjen
University Certificate (U.C.) in Immigrant Languages Education

Namn

Personnummer (år må dag år)

har genomgått följande kurs/kurser och/eller utbildningsmoment, enligt högskoleförordningen, inom grundläggande högskoleutbildning på hemspråkslärarinjen.

Utbildningslinjen omfattar 80 poäng.

Kurs/utbildningsmoment

Kurs/utbildningsmoment	POÄNG
1. Introduktionskurs - Näsamhälle och skolan	6
2. Grundläggande kurs - Allmän lingvistik	4
3. Kultur, uppfostran, språk I	6
4. Fördjupning i svenska och hemspråk	6
5. Studiehandledning	10
6. Kultur, uppfostran, språk II	6
7. Kultur, uppfostran, språk III	6
8. Invandrarbarnet och språken	2
9. Invandraren och det svenska samhället	10
10. Praktikantjämnstgöring	10

Samtliga kurser är godkända. För Godkänd utbildning ges endast betyget GODKÄND.

Följande utbildningsmoment tillgodoräknas inom ramen för utbildningslinjens poängtal med anledning av tidigare genomförda studier

Fordringarna för högskoleexamen på hemspråkslärarinjen, hemspråk kurdiska är därmed uppfyllda.

[Signature]
Per rektorsämbetets vägnar

Per-Olof Rehnquist, utbildningsledare
Namn/Ämbetsställning

Utbildningsbeviset är utfärdat i enlighet med föreskrifter i UHÄ-FS 1980:41.

Detta bevis är fastställt av rektorsämbetet vid Högskolan för lärutbildning i Stockholm.

Detta exemplar har kontrollnummer 63/87

HÖGSKOLAN FÖR LÄRARBILDNING I STOCKHOLM, Box 34103, 100 26 STOCKHOLM, Telefon 08-22 16 80.

gelekî zêde heye. Heya niha her sal bi navîncî 30 kesî xwestiye ku di beşa kurdî de bixwîne. Lê herwekî ku hûn jî dizanin, ew kes hemû nayên wer-girtin. Ji bo ku mirov di vê xwendegehê de bête qebûl kirin, divê mirov di azmûnên bi devkî û nivîskî de, hem bi zimanê Swêdî û hem jî kurdî, bi ser bikerve. Heya niha di xwendina sala yekemîn de 9, di ya duhemîn de 7 û

di ya sêhemîn de jî 6 xwendikar hatine qebûl kirin. Welê xuya ye ku dê îsal jî bi qasî 8-10 xwendikaran werbigirin. Sed heyf û mixa bin, ku hej-mara jinan gelekî kême e. Heya niha bi tenê 3 xwîşkên me ketine vê xwendegehê. Dido ji wan, yekê par û yekê jî îsal, xwandina xwe dawî anîn û jê derçûn. Me hêvî heye, ku îsal jî yek-du xwîşkên me hevparî vê xwendinê

bibin. Em hebûna wan û di vî warî de xweşdiyarbûna rola wan tiştêkî gelekî pêwîst dibînin. Lê çî mixabin e, ku civata me hê jî civata mêran e û newekhevî tê de mişe ne.

Heçî karûbarên me ne, weke ku hûn jî pê nas in, em di beşa kurdî de du mamoste ne. Yekî ji me ziman û yê din jî metodîka zimên hildaye ser milên xwe. Her yek ji me ji aliyê xwe ve hewil dide, da ku bi çêtirîn şêwe tiştêkî bide xwendekarên kurdî û wan serwest bike. Lê divê em bibêjin, ku ev ne karekî hinde hêsan û gengaz e. Berî her tiştî em ji navgîn û materyalên kurdî yê xwendin û perwerdekirinê bêpar in. Çawan li ser ziman, dîrok û edebiyat wisan jî li ser metodîka zimanê kurdî, çu tiştêkî sûdbexş, kelk û feydedar di destên me de tune ne. Hevçendî kurdî ev jî nivsedsalî bêtir e, ku li Kurdistana Başûr dihête xwendinê jî, lê ew jî hê jî çareser kirina van pirsan gelekî dûr e. Ne bes di warê ziman de, bo nimûne di warê metodîk de jî çu berhemê berbiçav tune ye. Di dirêjahiya wan 50-60 salan de pîrgirêkeke weke metodîkê derneketiye(!) pêşberî van perwerdekarên me, ku rûnin û li ser wê serên xwe biêşnin. Xebateke zanistî bikin û wê weke beşek ji zanistê bidin xwendin. Em ne bi tenê ji tecrube û xebata Kurdistana Başûr, lê herweha ji ya Kurdên Sovyetistanê jî nikarin kelk û feydê werbigirin. Ji ber ku wan jî di vî nivsedsalî de di warê metodîk û zimên de, zêde tiştêkî de neafirandin. Ji alîkî din jî, heçî metodîka kurdî ye, îro zimanê kurdî bi sê alfabe-yan dihête nivîsîn. Metodîka zimane-kî helbet ta kêrteke bilind bi alfabe-ya ku ew pê dihête nivîsîn ve girêdayî ye. Ne hewce ye, ku em niha behsa vê yekê bikin. . . Lê herwekî hûn jî dibînin, em jî û xwendekarên me jî, em di tunebûnekê de ne. Di gel hindê jî em hêvîdar in, ku bi kêmanî di çarçewa Swêdê de be jî, em ê di rojên pêş de ji xebat û tecrubeyên xwendekarên xwe yê ku niha bûn e mamosteyên kurdî û herweha yê ku ji berê de

mamostetiye dikin, îstîfade bikin. Li vir pêwîst e destnîşan bikim, ku herçendî Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Swêdê komeleke nûsazkirî be jî, divê ew di vî warî de rola xwe bilîze.

Me niha daye ber xwe, ku em vê payîzê careke din jî herin Sovyetistanê, herêmên ku Kurd lê dijîn. Helbet eger vê carê jî Sosretiya vîzeyê derne-xînin pêşiya me û xwendekarên me ji gereke lêhûrnêrinê bêpar nekin. . . Niha hevalên xwendekar hatine wazî-fedar kirin, ku li ser babetên cihê yê di warê Kurdên Sovyetistanê de çend bend û nivîsarên zanistî binivîsin. Me dil heye ku em paşê wan bendan bêtir û dewlemendtir bikin, wan weke pirtûkekê çap bikin. Tevî vê jî, em niha dixebitin ku termînolojiya dersên têvel amade bikin û çap bikin. Em dibînin ku di vî warî de kêmasî û pêwîstiyê yekcar zêde heye. Karûbarên ku divê em bikin, gelek in, nayên hesêb. Me çend proje hene. Lê ya herî çêtir ew e, ku mirov dest bia- vêjê, bike û paşê bipeyîve. . .

Em we ji dil û can pîroz dikin, ku we îro dîploma mamostetiya kurdî wergirtiye û hûnê dest bi xebata bi zimanê zikmakî perwerdikirina zarokên Kurdan bikin.

Gelo hûn dikarin ji keramên xwe re çend gotinan li ser xwendina xwe û rojên pêşiyê bibêjin.

Mîro:

Wekî tê zanin, beşa kurdî ya xwendegêha berz ya mamostetiye sê sal berê vebû. Em grûpa dudiyar e ku ji xwendegêhê der çûn. Bi rastî mirov di vê xwendegêhê de gelek cudatîyên di navbera xwendina li welatekî demokratîk û yê din de dibîne.

Me di van du salên xwendinê de, dersên pedagojî, metodîk, zimanê zikmakî; zaravyên kurmançiya jêrin (Sorani) û kurmançiya jorin û her sê alfabe-yên ku kurdî pê tene nivîsîn, zanîna civakî, zanîna fenî û hwd û em bi xurtî li ser van babetan sekinîn.

Ne hewce ye, ku mirov behs bike ku ciyê zimên di jiyandê de çiyê, ne çiyê. Em hemû baş dizanin ku ev tişt

ji bo me kurdan ji her miletî bêtir pêwîst e. Ji ber wiya her kurdekî ku dixwaze ji hêla zimanê zikmakî xwe baş têbigihîne û di vî warî de kar bike yan jî bi kêmanî hin tiştan fêr bibe, divê xwe li vê xwendegêhê bigîne. Ew dezgeheke hêja ye û divê em jê îstîfa- de bikin.

Xezal:

Ez dixwazim berî her tiştî bêjim, ku kurdên ku li Swêde dijîn divê qiyeme- teke taybetî bidin vê Beşa Kurdî ya Xwendegêha Bilind ya Mamostetiye. Ji ber ku cara ewil e imkaneke wisan baş ketiye destên me, ku em bikaribin wekî mamosteyên kurdî di sewiya mamosteyên netewên din de xwe perwerde bikin û bi dû re jî zarokên xwe bikaribin perwerde bikin. Her çiqasî em jî aliyê materyalan de weke grubên din ne xwedî imkan bûn jî, lê dîsan jî me berhemên van her du salan dîtîn. Divê mamosteyên kurd ên ku li Swêdê kar dikin, rojekê pêş da werin cem hev û problemên kêmsiyên materyalan bi awakî çareser bikin. Eger bi vî awayî nebe, însyatifa şex- sî li ser mamostan dimîne û metode- ke rast jî dernakeve meydandê. Ji ali- yê din de jî ez weke jineke Kurd dibî- nim, ku eleqeyên jinên kurdan bi vê xwendegêhê re pir kêr e. Daxwaz û hêviya min ew e, ku pêşdemê de hej- mara jinên kurdan di beşa kurdî de zêdetir be.

A. Vahap:

Berî her tiştî vebûna yan jî damez- randina beşa kurdî di Xwendegêha Bilind ya mamostetiye de ji bo me kurdan gaveke pir mezin û girîng e. Hêviya me domkirina vê xwendegê- hê ye. Bê şik ev jî bo tevgera kurdî jî, hem li Swêdê û hem jî bi giştî alîkarî û piştevaniyeke pir xurt e. Bê guman gelek kêmasî û problemên me ji aliyê ziman de hene. Lê, hêdî hêdî dê ev tişt jî nemînin. Ev hêviya me ye.

Amanca me kurdan, weke tevger, divê parastina vê sengerê be.

Mamostetiya Kurdî

HOŞMEND BARAN

Roja min ya pêşin bû, dilê min ji heyecanê weke kevokekê tirsayî hil-diavêt. Piştî du salên xwendekariyê min dê wê rojê dest bi kar bikira. Dilê min tijî hêvî, sêrê min bi fikrên cuda dagirtî bû. Çanta min di destê min de, ez bi lez û heyecan dimeşiyam. Roj hatibû, ez du salan li hêviya vê rojê mabûm, belê tam du salan min ji bo xatirê vê rojê li zanîngehê xwendibû. Min dil hebû ku ez zanîna xwe ya du salan di vê rojê de nîşanî xwendekarên xwe bidim.

Bi van fikrên tével, ez gihêstibûm bûroya karûbarên dersa zimanên biyanî (Învandrarundervisning). Min deriyê bûroyê vekir û ez ketim hundir. Di saloneke mezin de, şeş masayên hesinî û li ser her sandalyan jî yên ku li ber masan bûn, kesek rûniştibû, piştî demekê, min xwe bi kesên ku li wê derê bûn, da nasîn û herwaha wan jî xwe bi min dan nasîn. Camêrekî ji wan, ku bejnîkurt û hinekî jî dagirtî bû, xêrhatin li min kir û ez birim odekê.

-Fermo rûne!

-Spas Ez ji xebardana camêr tê gihîştim ku ew ji Fînlândiyê bû.

-Eger tu bixwazî, ezê di derheqa karê te de hin agahdariyan bidim te.

-Bi kêfxweşî.

-Wek tê zanîn, di herêma me da gelek grubên biyanî dijîn. Belediya me jî bo mafên biyaniyan karên gelekî girîng dike. Armanca me ew e ku em bi her awayî bikaribin mafên biyaniyan biparêzin û wan bînîn cîh.

Camêr li ser kar û barê belediyê bi qasî 10 deqîqan peyivî û bi dû re;

-Herwaha em dixwazin, weke hemû grubên biyaniyan ji gruba kurdan re jî alîkarî bikin.

-Pir baş e!

-Lê par hinek problemên me hebûn.

-Problemên çawan?

-Par mamostekî me yî kurd hebû, lê hin ji dê û bavên zarokan nedixwestin ku mamosteyê me ders bide zarokên wan.

-Çima?

-Wan digot ku mamosteyê kurdî zimanê kurdî baş nizanê û kurdiyêke çewt hînfî zarokên me dike.

Ji ber ku haya min ji tiştên ku camêr behs dikirin hebû, min xwest ew hinekî behsa tiştên din bike.

-Ji bo şagirtan materyalên (kitêb, kovar) we hene yan na?

Camêr ji pakêta li ser masê cigarek derxist û ew pêxist, gulpeke kûr ji cigara xwe kişand û got:

-Tu rastiye bêjî, na. Lê par me çend kitêb û kovarên zarokan kiribûn.

-Pir baş e.

-Lê rojekê bavê şagirtê telefonî min kir û bi dengê gelek tûre "Hûn çawan kitêb û kovarên siyasî bi zarokên me didin xwendin." Ez rebenê xwedê kurdî nizamim û herwaha min nizanî bû di nav wan kitêb û kovaran de çi hatine nivîsîn jî?

Ji rewşa camêr xweş xuya dikir, ku ew ji kurdan gelek aciz bibû.

-Ez hêvî dikim ku tu dê rê nedî wan problemên.

-Ez jî hêvî dikim.

Piştî çend şîretên din, camêr kaxizêk dirêjî min kir. Li ser kaxizê nav û paşnavê zarokan, sinifên wan û navên dibistanên wan nivîsî bûn. Min li kaxizê nihêrî, 15 navên cuda, cuda hin bi erebî, hin bi tirkî 15 navê şagirtên min, gazin û şîretên camêrê bejnîkurt bi min da ji bîr kirin. Min li gor navê dibistanan berê xwe da dibistana herî nêzik. Şagirtan min ya vê dibistanê 7 salî bû û wê nû dest bi dibistanê dikir.

Min navê şagirta xwe nîşanê serkarê (rektor) dibistanê da. Ez û serkar bi hev re çûn sinifa ku şagirta min tê de bû. Serkar ez bi mamostaya şagirta min da nasîn. Mamosta bangî xwendekara min kir û piştre em bi hev re çûn sinifa ku serkar nîşanî me dabû. Min deriyê sinifê vekir û em li wê derê rûniştin.

— Çawan î?

-Baş im.

-Navê te Leyla ye, ne wisan e? Şagirta min tenê serê xwe hejand. Leyla keçeke gelekî bedew bû, wê

porê xwe yê reş û dirêj xweş şeh kiribû. Çavên wê yên reş dibiriqîn. Gumikên (hinarikên) wê yên sor ji şerman hîn sortir bûbûn.

-Leyla tu ji kujan aliya î Kurdistanê yî?

— Çi?

-Tu ji ku dera Kurdistanê yî?

Gumikên Leyla her ku diçûn, hîn sortir dibûn. Wê serê xwe kiribû ber xwe, weke ku wê dixwest xwe ji min veşêre.

-Leyla tu ji kujan heremê, mintiqê, dera Kurdistanê yî?

Leyla serê xwe hêdî, hêdî ji ber xwe rakir bi çavên xwe yên reş li min nihêrî û got:

-Mamosta lêt têngem.

Bi bersiva Leyla, ez di cîhê xwe de sar bûm. Ew soraniya ku ez di nav du salan de li zanîngehê fêr bûbûm tê nedikir ku Leyla ji min têbigihê. Min û Leyla bi hemû hunerên xwe, bi alîkariya dest û piyan, qelem û defter, wêne û kitêban 40 deqîqe bi hev re ders çêkir. Piştî dersê Leyla çû sinifa xwe û ez jî ji dibistanê derketim.

Kaxizêkê ku navê zarokan û navê dibistanan li ser bûn, di destê min de, min berê xwe da dibistaneke din. Li ber dibistanê min navê şagirtê xwe û sinifa wî nîşanî şagirtê da û jê pirsî, ku ka ew dikare alîkariya min bike. Şagirt bi min re heta sinifa şagirtê min hat. Min spasî wî kir û li deriyê sinifa şagirtê xwe xist. Mamosteyê şagirtê min ji min re derî vekir.

— Çi dixwazî?

-Ez dixwazim bi Celal re bipeyîvim, ez mamosteyê wî yê zimanê zim-makî me.

-Gelelkî baş e, Celal were, va mamosteyê te yê kurdî hatiye.

Şagirtê min ji şûna xwe rabû û ber bi min hat, hemû şagirtên sinifê li me dinihêrin.

-Roj baş Celal.

Şagirtê min serê xwe hejand. Min destê xwe dirêjî wî kir, wî jî bê dil destî xwe dirêjî min kir û me bi destê hev girt.

— Çawan î?

DERMANÊ KÊÇA

BIRÎNDAR

Bajarê Diyarbekir bajarekî mezin e. Tê de cûrbecûr însan hene, her kes li gora keda xwe jiyana xwe didomîne.

Rojekê, yekî ereba xwe da pêşiya xwe, çend qutiyên dermanê kêça û çend pimpe kirîn, xwe bi xwe got "bi xwedê ezê îro dermanê kêça bifroşim, ji betalî çêtir e" û xwe bera nava bajarê Diyarbekir da.

Çû li ciyekî ereba xwe sekinand, bû qîrçîra wî û ban kir:

"Werin dermanê kêça, werin dermanê kêça!"

"Dermanê nexweşiyê, dermanê tawîya, bawîya, ev derman ji kêça re yek û yek e, de werin, de werin dermanê kêça!"

Bi qîrçîra wî mîlet li ser serê wî kom bûn. Hinekan kirîn hinekan ne kirîn, lê wî her ban dikir:

"Werin dermanê kêça, ev derman îro heye sibê tune, ji destên xwe nerevînin, xelasiya kêçan bi vî dermanî mimkin e, de werin!" û pesnê dermanê xwe dida.

Wê rojê jî yekî bajarî derketibû bajêr û dixwest ji bo mala xwe hin hewcedariyan bikire, yek ji wan hewcedariyan jî dermanê kêça bû.

Yê bajarî, carekê jî dûrve dengê ku

pesnê dermanê kêça dida, bihîst. Wî hema raste rast xwe li deng girt û berê xwe da wî alî. Piştî qederekê hat cem dermanfiroş, hinekî ponijî û jê pirsî:

— Birazî, ma tu dibê ev derman baş e gelo?

— Teww. . Apo teww. . Ma îşê derman e, xwedê jê razî! Hema tu dilopekê li hundur bireşîn û te îş pê tune, ku kêç bêhna derman bikin, bêî ku bêjin "lam û cîm" dikevin û li erdê diperpitin.

— Baş e, ma çêkirina vî dermanî çawa ye?

— Haaa. . Ji xwe huner di wir de ye. De biner! Tê berê hinek derman tîxî pîmpê. Paşê tê hinek av jî bera ser derman bidî û li hev xî. Îcar piştî ku te ew hunermendî kir, tê li hundur bireşîn û ji xwe tu dawîya felaketê zanî.

— Nebêj loo. . hevqasî bi tesîr e?

— Erê bi serê min û te.

— De baş e, naxwe ka kêsek derman û pimpekê bide min. Dermanfiroş kêsek û pimpek dayê, yê bajarî jî perê wî danê û hêdî hêdî berê xwe da malê.

Yê bajarî hat malê. Derman bera pimpekê da, hinek av jî bera ser da, li hev xist û li seranserî hundur reşand.

Wî di dilê xwe de pir kefa xwe tanî.

A dinî rojê, yê bajarî rabû ser xwe. Rebeno çavên xwe li seranserî hundur gerand, lê mixabin tu laş û maşê kêça nedît.

Rojek ji rojan yê bajarî cardin derdikeve bajêr û ji xwe re digere, carekê çawa çêbû, cardin dengê dermanfiroş ket guhê wî. Wî hema lez da xwe û berê xwe da dermanfiroş, çaxa hat cem, nerî ku ewî derman firotiyê wî ye.

Rabû destê xwe da pişt qûna xwe û got:

— Wey min hawha bi dermanê te kiro, ew te çî derman dabû min lawo!

— Xêre Apo, xêre însallah?

— Çi xêr û çî hal, dermanê te kêçek jî nekuşt. .

— Wehhh. . nebêj loo. . ev çî ecêb e yahoo. .

— Çawa ev çî ecêb e, ma ez derewan dikim?

— Apo qey te baş bikar naniye.

— Çawa min baş bikar naniye, te çawa gotibû min jî wilo kir.

— Na Apo na, ew tenê tîr nake.

— Naxwe çawa?

— De baş guhdariya biraziyê xwe bike. Çaxa te kêç dîtin ji nişkê ve xwe cem ke wan. Îcar çaxa te ew girtin rahêj derman û tîx çavê kêçan. Wê gavê tê derbê dermên bibîni, bê kêça dikuje yan nakuje! . .

-Ez kurdî anlamîş nakim.

-Were em li derve bipeyivin

-Na, na ez kurdî anlamîş nakim.

— Çima tu ne kurd î?

-Na, eyê min gotî kurmançî mexwîne, ezê tûrkçe bixwînim.

-Tîşt nabe, were em li derve bipeyivin.

-Na, ez kurmançî anlamîş nakim, ez kurmançî naxwazime.

Şagirtê min înatî dikir û nedihat der, min jî dixwest ka fêr bim ew çima kurdî naxwaze. Ez û şagirtê xwe weke du pehlîwanan destên me di destên hevûdu de, wî destê min ber bi hundir, min jî destê wî ber bi derve dikşand. Lê ev tekoşîna me dirêj dom nekir. Min hew nihêrî hemû şagirtên sinifê li çepikan dixin û bi melodî weke ku meriv di pevçûnekî de piştigirtî li yekî bike, ew bi hevve diqijîn. Celal. . . Celal. . . Celal. . .

Mamoste jî pel, pel li me dinehêrî. Min jî şerman destê Celal berda û ez

bi lez ji sinifê derketim. Ji hêrsan destên min dilerizîn, min cigarek pêxist, hinekî bihna xwe da û berê xwe da dibîstaneke din.

Li vê dibistanê sê şagirtên min hebûn; 2 lawikên 10 salî û keçeke 11 salî.

Em li sinifeke biçûk rûniştin.

-Roj baş!

-Roj baş, roj baş!

-Ez mamosteyê we yê kurdî me.

Keçika ku bejndirêj û zirav bû, ji min pirsî

-Mamoste çî ye?

Min bi tirkî û swêdî jê re got.

-Laräre, Ögretmen

-Ha bavê min dibêje muelîm.

-Xem nake, tu mamoste bibêje!

-Na, ez ê muelîm bêjim.

Rûyê şagirta min tîrş bibû û wê bi awireke ne xweş li min dinihêrî.

-Baş e, tu muelîm bibêje!

Şagirt biçek nerm bû, wê li şagirtên din nihêrî û weke bûkeke bi naz

bişirî.

-Ma hûn hemû li malê kurdî dîpeyivin?

Keça bejndirêj dîsan di cîhê xwe de veciniqî û ji min pirsî?

-Dîpeyivin çî ye?

-Xeber didin, qise dikin.

-Ha, ha bavê min dibêje dîstexilin.

Şagirta bejndirêj nedihîşt, ku ez bipeyivim. Di serê her xeberdana min de dipirsî

-Ev çî ye?

Min bersîva wê yan bi tirkî yan jî bi swêdî jê re digot û wê jî digot;

-Ha. . ha bavê min wisa dibêjî. . .

Dema zil lêket, min di dilê xwe de got "Rebiyo tu alikariya min û mamostetiya min bike. Min jî şagirtên xwe xatir xwest û ji dibistanê derketim.

Çanta min di destên min de, ne heyecan ne jî fikir, weke eskerekî westiyayî hêdî, hêdî min berê xwe da rawestgeha trêne.

ELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM JI KOM

HEFTA DOSTANIYÊ

Îsal wezîrê biyaniyan George Andersson pêşniyarek ji hemû swêdî û biyaniyan re kir ku hefta 21-an (18-24 gulan) wek "Hefta Dostaniyê" bê pîroz kirin, ku dostanî û hevkarî di nabeyna swêdî û biyaniyan de xurtir bibe.

Di vê heftê de swêdî û biyaniyan hevûdu vexwendin malên xwe û rêxistinên swêdî û biyaniyan jî bi vê helkeftinê gelek karûbarên kultûrî li dar xistin.

Federasyona me jî di 21-ê gulanê de bi helkeftina "Hefta Dostanî" di navça Stokholmê de, li Sergelstorgê ji saet 17.00-an heta saet 19.00-an dîlanên kurdî pêşkêşî xelkê kirin. Koma Govend, Koma Şengal û Koma Komela Jinan bi dîlanên hêla

Diyarbekrê, Vanê û Hekariyê bala bi hezaran kesan kişandin.

Li ser navê Federasyonê bandroleke mezin bi nivîsa "Dostanî, Hevaltî, Piştgirî" bi zimanê swêdî û kurdî hate dalaqandin.

Serokê Federasyonê heval Hanefî Celeplî di axaftina xwe de bi kurtî weha got:

"Dostanî, hevaltî û piştgirî, îro şiyara me ye. Ew duhu jî şiyara me bû û wê hertim bibe şiyara me. Ji bo pêşdeçûnê li welatekî ev şiyar bê guman pêwîst in. Ji bo ku tu kes xwe li dervayî vê civatê his neke, divê hemû kes bi hev re bixebitin.

Êdî wext hatiye ku meriv peyva "biyanî" ji holê rake. Em hemû mirovên ku li vî welatê dijîn -ger em

li vir an li welatekî din hatibin dinê-rûniştvanên vî welatê ne.

Îro mirov pir caran dibîne ku tevgerên nijadperest bi awayên cure xwe nîşan didin. Hevalên hêja, nijadperestî ne tenê tehdîteke li dijî biyaniyan e, lê herwisa ew tehdîteke gelekî mezine li dij civatê û hemû mirovaniyê. Dîrokê, nijadperestî mahkum kiriye û ev dîtina wek dijminê mirovaniyê nîşan daye. Lewra divê em bi hemû hêzên xwe ve li dijî nijadperestiyê bisekinin. Em înişyatîfa wezîrê biyaniyan Georgê Andersson wek gaveke positif dibînin û hêviya me ev e ku ev înişyatîfa positif bi heftekî neyê sînor kirin, divê dostanî hertim hebe."



JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

ÖREBRO

Komela Çanda Kurdî Li Örebroyê, raporek li ser xebata xwe ya biharê ji Berbangê re şandiye. Di rapora xebatê de hatiye kifşkirinê ku Komela Çanda Kurdî Li Örebroyê ev karûbarên jêrîn kirine.

-Di civîneke Federasyona Dijî Nijadperestiyê de, roja 8-ê adarê, semîna-rek li ser Kurdistanê hat dayîn. Di semînarê de şêst kes beşdar bûn.

-Di roja 18-ê nîsanê de cejna Newrozê hate pîroz kirin. Di şevê de 300 kes; ji Komîta Kultûr ya Örebroyê, ji Dibistana Bilind ya Gelerî û gelek mêvanên swêdî beşdar bûn. Li ser Kurdistanê agehdarî hate dayîn. Kultûra kurdî hate pêşkêş kirin. Stranên kurdî ku heval Ferhat Baban gotin, gelekî bala mêvanan kişand.

-Di hefta dostaniyê de, rojên 20, 21 û 22-yê gulanê, li Dibistana Bilind ya Gelerî û di lokalên dêrê de koma folk-



lor ya Komelê û heval Ferhat Baban stran û dîlanên kurdî pêşkêş kirin. -Di roja 15-ê gulanê de, endamên

Komelê belavoka ku Federasyonê derxistibû, li bajarê Örebroyê belav kirin.

LUND

Li Lundê Komîta Piştgiriya Kurdistanê hate damezrandin

Di roja 16-ê gulanê de, Komela Kultûrî Kurdistan civîna xwe ya giştî li dar xist. Di vê civînê de ji bo piştgiriya tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê, "Komîta Piştgiriya Kurdistanê" hate damezrandin. Piştî civînê filimek li ser Kurdistanê hate nîşandan.

Di civînê de nûnerên Partiya karkerên Sosyaldemokrat, ABF û Yekîtiya Ciwanên Partiya Gel (FPU) beşdar bûn û piştgiriya xwe bi gelê kurd re nîşan dan.

Di roja 23-yê gulanê de civîneke din jî ji bo danîna programa xebatê ya Komîtê hate çêkirin.

Roja zarokan

Komela Jinên Demokratên Kurdistanê Li Swêdê di roja 23-yê gulanê de şahiyek ji bo zarokên kurd li taxa Stokholmê, Tenstayê amede kirin. Ev şahî bi helkeftina "Roja Zarokên Cîhanê" ku ji alî Koma Netewan de hatibû îlan kirin, çêbû. Di şahiyê de gelek zarokên kurd bi dê û bavên xwe ve beşdar bûn. Komên zarokên kurd dîlan û stranên kurdî pêşani mêvanan kirin.

Spânga

Komela Kurdistanê Li Spângayê, di roja 2-ê gulanê de şeveke dostaniyê pêkanî. Di şevê de stranên kurdî û skêçek hate pêşkêşkirin. Dora 300 kes di şevê de beşdar bûn.

Huddinge

Di roja 22-yê gulanê de, Komela Kurd Li Huddingêyê û Komîta Aştiyê bi hev re şeveke aşî û piştgiriya li dar xistin. Di şevê de stran û dîlanên kurdî û herweha stranên gelerî ji Afrîka Başûr hate pêşkêş kirin. Babeta axaftina şevê li ser aştiya cîhanê bû.

Järfälla

Di 23—88- gulanê de, bi helkeftina "Hefta Dostanî"yê, Komela Kurd Li Järfällayê beşdarî Festîvala Järfällayê bû. Li ser daxwaza Komelê, Koma Govend dîlanên kurdî pêşani xelkê kirin. Gelek swêdî û biyanî bi hewaskarî li dîlanên kurdî temaşe kirin.

XEBATA FEDERASYONÊ YA SÊ

Di roja 16-ê gulanê de, Komîta Giştî ya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê civîna xwe ya duhemîn li dar xist. Di civînê de Komîta Kargêr ya Federasyonê rapora xebatê ya sê mehî xwend. Endamên Komîta Giştî li ser rapora xebatê sekinîn û bi giştî pîroz-

bahaiya xwe ji bo Komîta Kargêr pêşkêş kirin.

Di vê civînê de herweha du komîteyên nuh: komîteke arşîvê û komîteke paneberên kurd hate hilbijartin. Komîta arşîvê wê ji bo sazkirina arşîvekê di lokala Federasyonê de karûbar bike. Komîta

paneberan jî wê di kampên paneberan de, ku kurd lê hene, bigere û li ser pirs û pirsgirekên wan raporekî amede bike.

Em li jêrê rapora Komîta kargêr ku di civînê de pêşkêşî Komîta Giştî kiribû, diweşînin.

Komîta Kargêr ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, civîna xwe a yekem, piştî kongra 7-em di roja 21.2.1987 an de li dar xist. Di civînê de, vatîni di nav komîta kargêr de hatine parve kirin. Ji bo sekreterê Federasyonê û ji bo berpirsariya Berbangê heval Keya û ji bo sekreterê malî yê Federasyonê heval Dicle hatine hilbijartin. Vatîni bi heval Cemal û heval Keya hate spartin, ku bi redaksiyona kevin re têkiliyê deynin ku karê redaksiyonê bidomînin. Ji bo programa xebatê ya sala 1987-an pêşniyar hat kirin û serok û sekreterê Federasyonê vatîni girtin ku pêşniyarên Kongra 7-em û Komîta giştî li berçav bigrin û programeke xebatê hazir bikin.

Di civîna Komîta Kargêr ya diwemîn de jî heval Cemil wek sekreterê ciwanan û berpirsarekê têkiliya bi Komelên endam re hate hilbijartin. Heval Dr. Cemşid jî wek berpirsarekê Federasyonê ji bo semîneran hate hilbijartin.

Her weha di civîna diwemîn de, ji serok, sekreter û sekreterê malî yê Federasyonê, sekreteriyatek hate damezrandin, ku karibin di karûbarê acil de biryaran bigrin.

Spasnameyek ji bo beşdarên Kongra 7-em

Piştî kongra 7-em, Komîta Kargêr ji bo hemû mêvan û rêxistinên ku di kongrê de beşdar bûbûn, an jî brûsk şandibûn, nameke spasdariye şand.

Karkerên nuh ji bo Federasyonê

Ji bo Federasyonê, isal karkerekî nuh hate girtin. Bi vî awayî karkerên Federasyonê bûn sisê. Meaşên karke-

rên Federasyonê wilayeta Stockholmê ji %90-î dide, Federasyon jî ji %10-î dide.

Sersala kuştina Olof Palme

28-ê Sibatê, kuştina serokwezîrê Swêdê Olof Palme bû. Bi vê helketinê Partiya Karkerên Sosyaldemokrat li hemû Swêdê tevgereke mezin pêkanî. Federasyonê bi nameyekê kurdên Swêdê û komelên endam li ser vê bûyerê agahdar kirin. Roja 28-ê Sibatê jî endamên Komîta Kargêr ya Federasyonê û berpirsarekê komelên endamên Federasyonê li bajarê Stockholmê çelengek danî ser gora Olof Palme.

Herwisa, li ser navê Federasyonê nameyeke bîranînê, ji bo malbata Palme, ji Partiya Sosyaldemokratî û ji hûkûmeta Swêdê re hata şandin.

Di vê rojê de jî gelek kurd di meşa bîranînê de cih girtin. Federasyonê li ser vê rojê daxuyanîyek jî belav kir.

Civînek bi Daîra mihaciran re

Ev civîn di bin serokatiya Daîra Mihaciran (SIV) her sal çêdibe. Nûnerên hemû federasyonên biyaniyan di vê civîna de beşdar dibin û li ser rewşa biyaniyan diskînin.

Civîna isal li ser "Bazara kar û biyanî" bû. Berpirsarekê sazûmanên bazara kar (Arbetsförmedling, AMU, AMI, LO û her wisa Invan-drarbyrå û Socialförvaltning) di civînê de beşdar bûn. Li ser navê Federasyonê jî sekreterê Federasyonê heval Keya beşdarî civînê bû.

Ji aliyê kardîtinê de rewşa biyaniyan hat muneqaşe kirin. Pêşniyar û daxwazên rexistinên biyaniyan hatin pêş-

keşkirin.

Herwisa li ser rewşên Federasyonên biyaniyan hat sekinandin. Civîn 2 roj ajot.

NEWROZ

Cejna Newrozê isal li gelek bajarên Swêdê hate pîroz kirin. Piraniya komelên endamên Federasyonê li bajarên xwe Newroz pîroz kirin. Li Stockholmê, Uppsalayê, Sundsvälê, Bollnäsê, Eskilstunayê, Karlskogayê, Söderhamnê, Göteborgê, Lundê, Jönköpingê û li gelek bajarên din jî Newroz bi bi tevayî hate pîroz kirin.

Plankirina şevên Stockholmê piştî kongra 7-em dest pê kiribû. Beriya Kongreyê Komîteke Newrozê hatibû tesbît kirin. Lê paş kongreyê du hevalên vê Komîteyê nedixwestin vatîniya xwe bidomînin. Lewra di bin berpirsariya heval Keya de komîteke nû ava bû. Komîta nû ji 7 kesan pêk hat û nunerên Komelên derûdora Stockholmê di vê komîteyê de beşdar bûn.

Di programên şevên Stockholmê û Uppsalayê de Ciwan Haco, Delal, Rênas, Koma Govend, Koma Jinan û Koma Alan Botan beşdar bûn.

Wekî din jî bi têkiliya Federasyonê Koma Govend hat şandin bo Newrozê Karlskogayê, Sundsvälê, Söderhamnê, Upsalayê, Eskilstunayê, û Bollnäsê.

Di şeva Newroza Stockholmê de nêzîkî 1000 kes beşdar bûn. Şev ji aliyê dûzen û programê bi rêkûpêk bû. Lê piştî şevê Komîta Kargêr hinek kêmasiyên şevê jî tesbît kirin.

BERBANG

Komîta Kargêr di civîna xwe ya 1 û 2-an de li ser karûbarên Berbangê

MEHÊN PIŞTÎ KONGRA 7-EM

û Redaksiyona Berbangê sekini?

Di civîna 1-em de Keya ji bo berpirsiyariya Berbangê hat hilbijartin. Biryar hat sendin ku Redaksiyon wek berê bimîne, lê heçî mecal hebe hevalêkî din tevî redaksiyona kevn bibe.

Redaksiyonê civîna xwe ya yekem di roja 21.3.1987-an de çêkir. Di civînê de R. Zilan, M. Bekir, C. Reşîd, R. Simo, Keya û Henefî (wek lêner) beşdar bûn. Li ser pirsên Berbangê û li ser firebûna redaksiyonê hat axaftin. Herwisa rexne ji aliyê endamên redaksiyonê hat kirin ku bo Berbang di wextê xwe de dernakave. Hevalên endamê Komîta Kargêr, Keya û Henefî wan rexneyên hevalan di cîh de dîtin lê her wisa sebebên derengketina kovarê ji bo hevalan dan xuya kirin.

Redaksiyon wek berê qebûl bû. Ji bo firehbûna wê, vê gavê hevalên beşdar pêwistî nedîtin.

Heval R. Zilan bi pêşniyara hemû havalan wekserek redaktor hat hilbijartin.

Hemû hevalên beşdar diyar kirin ku divê Berbang di wexta xwe de derkeve û ji aliyê naverokê de jî dewlementir bibe.

Dawetiya ji Enstîtuta Kurd Li Parisê

Enstîtuya Kurd Li Parisê, di dawîya Nisanê de civînek li ser zîmanê kurdî û pirsên zîmanê kurdî pêk anî. Ji bo vê civînê nûnerêkî Berbangê dawetî civînê kiribûn. Redaksiyona Berbangê biryar da ku kak R. Zilan li ser navê Berbangê biçe civînê. Civîn heft roj bûn û li paytextê Katalonya, Barselonayê pêk hat.

Civîn bi Komela Jinan re

Di 25-ê Nisanê de civîneke informatîf di navbera Federasyon û Komela Jinan de pêk hat. Heval Henefî û Keya ji Komîta Kargêr û 4 hevalên jin ji Komîta Kargêrê wan di civînê de beşdar bûn. Herdu alî inforasyon dan hevûdû. Li ser pirsê "Seksiyon" hat sekinandin. Ev pirsê wek pêşniyar wê di civîna endaman ya Komela Jinan de bê axaftin û ber-

sivek wê di vî warî de ji bo Federasyonê bête şandin.

Komîsyona Multeciyan

Komîta Kargêr biryar da ku Komîsyona Multeciyan dîsa wek berê xebatên xwe bidomîne. Heval Keya wek berê berpirsiyarê Komîsyonê ye, endamên Komîsyonê ji wek berê bimînin.

Di şûna Keya de, heval Bekir wê heftê du rojan wê li Federasyonê kar bike.

Wî hevalî dest bi kar kir û niha jî karê xwe didomîne.

Semînarêk li ser kurdan

Di 7 û 8-ê Îlonê de, SIV (Daîra Mihaciran ya Dewletê), Komûna Eskilstuna û Federasyona me wê semînarêk li ser kurdan ji bo Beladiyên Swêdê amade bikin. Ji bo haziriya semînarê heta niha sê civîn çêbûne, program hazirbûye. Giraniya semînarê li ser milên Federasyonê ye.

Civîn bi komelên endam re

Di 19.04 1987-an de Komîta Kargêr ya Federasyonê, bi Komelên endam re civînek çêkir. Komelên endam di derbara karûbarên xwe de aghdarî dan. Herwisa Komîta Kargêr jî di derhaqa xebatên Federasyonê de aghdarî da komelan.

Li ser meşa 1-ê Gulanê hat sekinandin. Komîta 1-ê Gulanê hat avakirin.

Têkîlî di gel komelên nûh

Piştî kongra 7-an a Federasyonê, digel hinek komelên kurd li bajarên Swêdê pêwendî hate danîn. Bi komelên kurd li bajarên Jönköpingê, Lundê, Örebroyê, Vesteråsê û Norrköpingê civîn hatine çêkirin û di civînan de li ser avayiya Federasyonê aghdarî hat dayîn. Heta niha Komela Kultûrî Kurd Li Baçûra Swêdê -Lund û Komela Kultûrî Kurd Li Jönköpingê bûne endamê Federasyonê. Komelên mayîn jî pêwendiyên xwe li gel Federasyonê xurt dikin û pêş de dixwazin

bibin endamê Federasyonê.

1 GULAN

Komelên endamên Federasyonê tevî endamên xwe ve îsal li bajarên ku tê de rûdinin, bi xurtî di meşên 1-ê Gulanê de beşdar bûn û bandrolên li dijî hukumatên dagirker bilind kirin. Belavoka ku Federasyonê hazir kiribû bi hezaran li xelqê Swêdê hat belavkirin.

Li bajarê Stockholmê jî welaparêzên kurd di bin bondrola Federasyonê de di meşa VPK de beşdar bûn. VPK, rê da kû Federasyon di civîna 1-ê Gulanê de axaftinekê bike. Di axaftina Federasyonê de li ser rewşa gelê kurd hate sekinîn û li ser êrîşên li Kurdistanê hate behs kirin. Herweha bala hemû demokrat û pêşverûyan hate kişandin, ku li hember êrîşên li Kurdistanê bêdeng nemînin. Piştî axaftina Federasyonê Koma Govend dîlanên kurdî pêşanî hezaran ji beşdarên meşê kir.

Meşa protestoyê li dijî rêjîma Tirkîyê (Roja 07.03.1987-an)

Rêjîma Turkiye bi 30 Jêtên leşkerî va, di roja 4-ê Nisanê 1987-an de êrîşeke hov bir ser Kurdistana Iraqê û 9 gundên kurdan bombebaran kirin. Li ser vê êrîşa Tirkîyê, Federasyona me belavokek bi zîmanê Swêdî di eynî rojê de derxist û êrîşa hov protesto kir. Belavok seranser Swêdê hat belav kirin.

Ev belavok ji hemû rêxistinên siyasî û civakî û her weha jî hemû sefaretên ku li Swêdê de hene re, hate şandin.

Di roja 7.3.1987-an de jî Federasyonê meşeke protestoyê li dijî sefareta Tirkîyê amade kir. Di meşê de gelek rêxistinên Kurdistanî û pêşverûyên Tirk, Ereb û Sûryanî beşdar bûn. Gelek rêxistinên siyasî û demokratîk binê metna protestoyê îmza kirin.

Parlamentê Partiya Karkerên Sosyal Demokrat, Abûkat Hans Göran Franck, parlamentê Partiya Komûnîst ya Çep, Oswald Söderqvist û

serekê Federasyonê heval Hanefî Celeplî axaftin kirin û rêjîma Tirkîyê mahkum kirin. Radyoya Swêdê di meşê de beşdar bû û bi axîfbêjan re hevpeyvîn çêkir û ev nûçe sererast di xeberên nivro de belav bûn.

Roja din jî rojnameyên mezin yê Swêdê Svenska Dagbladet û Dagens Nyheter qala meşê kirin û ci dane axaftinên parlamentan û berpsiyarê Federasyonê.

Di meşa protestoyê de 250 kes beşdar bûn. Li pêş sefareta Tirkîyê teksta protestoyê hat xwendin, slogan hatin avêtin û srûda millî Ey Reqîb hate xwendin.

SEKSIYONA CIWANAN

Di nava Federasyonê de ji bona rêxistina ciwanên kurd û pirsên wan seksiyonek hat avakirin.

Heval Cemîl wek sekreterê seksiyona ciwanan û heval Îbrahîm jî wek alîkar hatin hilbijartin.

Ji bona avakirina "Yekitiya ciwanên Kurd li Swêdê" di nava Federasyonê de hin xebat me kirine:

-Ji bo karûbarê ciwanan, berî her tiştî lêkolînek hate kirin û berpsiyarên vî karê ji tecrubeyên federasyonên din îstîfade kirin. Ji bo vê armançê bi Federasyona Yewnaniyan re civînek hate çêkirin. Di civînê de serekê Federasyonê û sekreterê ciwanan beşdar bûn.

-Destûrek ji bo seksiyonên ciwanan di komelan de hate hazir kirin. Herweha li ser ûsûla sazkirina seksiyonan form hatin hazir kirin û ji komelên endam re hate rêkirin. Heta niha şeş komelan seksiyonên ciwanan damezrandine.

-Li cem hukûmata Swêdê jî Federasyonê muraceata salewxtî ji bo alîkariyê kir. Ev cara yekem e, ku Federasyona me ji bo ciwanan ev kar kiriye. Hêviya me ev e ku hemû ciwanên kurd û dê û bavên wan ji bo pêşdebîrîna xebata bona ciwanan kar bikin.

Destûra Federasyonê

Destûra Federasyonê, tevî guhartinên kongra 7-em ji nû ve hazir bû û ewê di demek kurtde bi kurdiya xarû û jorîn û bi Swêdî çap bibe.

Heval Cimsîd ji bo semîneran programek hazir kiriye. Ev programa dê wexteke kinde bê çapkîrîn û tevî

babet, cîh û demên semîneran bête belavkirin.

CIVÎNÊN BIMEQAMÊN SWÊDÊ RE.

Civînek bi Komîta rewşa zarokan (Barnmiljörâdet) re:

Di 26-ê Adarê de, Federasyonê bi (Barnmiljörâdet) Meclisa Rewşa zarokan re civînek çêkir. Di civînê de li ser rewşa zarokên kurd li Kurdistanê û li Swêdê agehdarî hate dayin û hate xwestin, ku Barnmiljörâdet bi zimanê Kurdî ji materyelên agahdariyê belav bike. Herweha li ser rewşa zarokên kurd di dibistanên Swêdê de hate sekinîn. Nûnerên Barnmiljörâdetê razîbûna xwe ji agahderiyên Federasyonê re diyar kirin û dane kifşê wekî ewê li ser pirsê zarokên kurd bisekinin.

Civînek bi ABF'ê re

Di 4-ê Adarê de, serok û sekreterê Federasyonê li gel berpsiyarên ABF-Stokholmê civînek çêkirin û di civînê de li ser hevkeriya Federasyonê û komelên wê bi ABF'ê re hate sekinîn. Federasyonê broşûreke ABF—ê - li ser xebata wê tercumeyî kurdî kir. Dîsa hate axaftin wekî li bajarên Swêdê Federasyon û ABF bi hev re li ser rewşa kurdan semîneran amade bikin. Ev xebat wê peyizê dest pê bike.

Civîn bi hukûmeta Swêdê re

Sekreterê dewleta Swêdê, Jonas Wîdgren di Koma Netewa de kareke nuh girt û bi vî munasebetê civînek çêkir. Federasyona me jî ji bo civînê hate dawet kirin. Ser navê Federasyonê, serokê Federasyonê destek gul û nameke spasiyê ji bo hevkeriya borî pêşkêşî Jonas Wîdgren kir.

Di roja 7-ê Gulanê, li ser vexwandina wezîrê biyaniyan George Andersson, Sekreteriyata Federasyonê di civînekê de beşdar bû.

Civîn, berdeyema civîna Federasyonê bi hukûmetê ra ya di roja 2.1.1987-an de bû. Li ser rewşa kurdan li Swêdê hate sekinîn. Hukûmatê xwest bizanibe, ku kurd piştî spekulasyonên ku li ser kurdan bi girêdayî kuştina Olof Palme hatibû kirin,

xwe çawa his dikin. Nûnerên Federasyonê diyar kirin wekî, tirs û şika kurdan kêm be jî hatiye sekinandin. Niha rewşa kurdan ji berê baştir e. Herweha di civînê de rewşa multeyên kurda jî hate bahskirin.

Civîna Nordiska Râdet (Meclisa Skandinavya)

Di rojên 22-24-ê Nîsanê de, Nordiska Râdet li ser pirsê multecî û mûhaciran semînerê 3 rojane hazir kirin. Di civînê de serokê Federasyonê heval Hanefî Celeplî jî amade bû û tevî kar û barê grûpî bû.

Di civîna ku gelek nûnerên parlementer ji welatên Skandinavya û nûnerên Koma Netewan amade bûbûn, nûnerê Federasyonê bi gelek kesan re têkîlî danî û bala wan li ser pirsê kurdî kişand.

Civînek bi Komela Bergîriya Netewî re (Civîlförsvarsföreningen)

Di roja 24-ê Adarê de, li Jönköpîngê civînek li ser bergîriya netewî (Civîlförsvar) bi rêxistinên biyanî re hate amade kirin. Li ser navê Federasyonê jî heval Şoreş di civînê de beşdar bû. Di civînê de li ser tevîbûna biyaniyan bergîriya netewî hate sekinîn. Rêxistinên biyanî, herweha Federasyona me ev înişyatîva posîtîv dît.

KAR Û BARÊN AGEHDARIYÊ

Piştî kongra 7-em, ji gelek ci û kesên swêdî daxwaz hat kirin ku li ser kurdan informasyonê bigrin. Ji nêzî deh kesan re informasyon hate şandin. Li bajarên Stefantorpe, Göteborg, Östersund, Söderhamn, Jönköping, Stokholm û Umeåyê ji xwendegê û belediyayê diawênê li ser Kurdistanê hatin şandin.

Di roja 28-ê Nîsanê jî li bajarê Västeråsê, ji bo zarokên xwendegê du nûnerên Federasyonê li ser Kurdistanê semînerê ji bo şagirtên şeş sinfên 7-an semînerê dan. Di semînarê de bêtir li ser rewşa zarokên kurd li Kurdistanê hate sekinîn.

Li bajarê Stokholmê jî, di roja 6-ê Gulanê de serokê Federasyonê ji bo karkerên Socialkontoret (Daîra civakî) li ser tarîx û rewşa Kurdistanê rojekê ders da.

Ji çîrokên geleri

Kutana sing

Hesenê Metê

Ji şevan şeveke biharê bû. Ewrên reş xwe berdabûn şer rûyê erdê û çav çavan nedidîtin. Ji hêlekê ve xofa ku tariya reş dixist dilê merivan û ji hêlekê ve jî, goristan û miriyên di gorê de dihatin qal kirin. Qalkirina gor û miriyan jî, tirsek bêpîvan dixist ser civatê. Şevbuherka vê şevê, di oda gund de ev bû. Gor û mirî. . . Şev li hev geriyabû dev û lêv li civata dorê ziwa bû bûn.

Dibêjin ku "Xezeba bizinê ji ber lingên bizinê radibe." Bi rastî jî ev civata ji xwe ne digeriya. Ji hêlekê tirs û xof, ji hêlekêve jî qerf û vir. . . Şertek hatîbû danîn. Kê bikaribûya biçûya ser goristanê û di bersalê gorekê de singek bikuta û bi saxî vegeriya; mêraniya wî ê li nava gund bihata gotin û belav bibûya.

Feqî û sofîyan bang dikirin û digotin:

-Law xwe gunehkar mekin!. . . Ma ji bilî miriyên goristanê tiştek nema ku hûn pê henekan bikin!?"

Lê li hêla din hinekan firqûziya xwe didomandin û dixwestin hinekan pîj bikin.

-Divê şeva tarî de, tu kesek tune ku bikari be biçe û di bersalê gorekê de singekî bikute.

-Ev kara gelekî çetin e û ne karê kurê her bavekî ye.

-Bi rastî jî kî bikari be viya bi cî bîne, di ser wî re mêr heram e.

Herweha feqî û sofîyan, ji gunehariyê xwene didan ber viya û ji yên bêsewad tu kesek bi kêrî vî tiştî ne dihat. Ji bextreşî re yekî ku bêbawerê van tiştan jî, li wir bû. Baweriya xwe ne bi tirs û xofa gor û goristanê, ne jî bi tiştên batîni dihanî. Tiqe tiqa wî bû di ber xwe de dikeniyê. Ji van galegalên tewş û erzan, qet tiştek ber bi hişê wî de ne diçû, tiştek ne diket serê wî. Lewra, gor û goristana ku li ser dihat peyivîn, her roj ker û dewar li ser diçeriyên û bi ser de dimîstin. Tew tema wî tune bû, bi xwe têkilî vî tiştî be û ew jî du peyvyan bike. Lê dema ku nêhîrî, civatê, kutana singekî pir mezin û dijwar nimand, ew jî rabû ser xwe û ji civatê re got:



-Hevalno!. . . Ez ê niha biçim û singekî li ser goristanê bikutim. Lê ji bona ku hûn béguman ji min bawer bikin, divê hûn ji min re bibêjin, ka ev singa di bersalê gora kê de tê kutan?

Ew merivekî navsal bû. Bi rastî jî ji tirs û xofa tiştine wusa bê hay bû. Li rasta oda gund, li benda sing hanîna civatê bû. Piste pist keti bû nava civatê, merivan digot qey dê welatek were xera kirin an jî şên kirin. Bi qasekê, ji civatê yekî sing û mîrkutek hanî li ber xort danî. Mêrik bêsik û bi bişîrîn sing û mîrkut girt û got:

-De ka we ne got. . . Ez vî singî di bersalê gora kê de bikutim?

Ji firqûzên civatê yekî zimandirêjî ji hemîyan stand û got:

-Ku tu bikari bî sing bikutî, tu dizanî ku wan dê û bavên min herdû jî mirine û di ber hevdu re dirêjkirî ne. Te kîjan divê, hema sing di bersalê wê de bikute.

Mêrik ji civatê qetya bû jî. Sing û mîrkut di dest de, ketî bû riya goristanê. Herder reş mîna teniyê dixuyan. Çilkên baranê xwe berdidan xwarê. Goristan biqasî sed werîsekî ji gund dûr bû. Heta nivê rê ji tu tiştek ne ket bîra wî û li ser tiştekî jî ne fikirî. Wek rêveçûnekê hertim dimeşiya. Lê dema ku xwe gihand nivê rê, xwe bi tena serê xwe his kir. Asûwas lê çêbûn û

qeqûre hatin ber çavan. Xofek mezin kete dilê wî û lerizî. Di rê de çavên xwe digirt tarî, vedikir tarî. . .

Dilê wî digot wek hertim, ne tirs û ne jî xofa gor û miriyan. Lê çî fêde ku di tarî û tenêbûna şeva vê şevê de; xofê xwe di hundurê dilê wî de li hev badida. Ji bo ku tenêbûnê li xwe belav bike an jî ji xwe dîr bixîne, difikand û diçû. Mixabin, ev fikandina wî jî, ne jê re dibû hevalekî roja giran û ne jî dibû berkela ber dilê wî. Poşmaniyê li serê wî xisti bû, lê, bişûnde vegera wî jî êdî bêkês bû. Belê, xort bi xof û dilxirçiyek wusa xwe gihand ber goristanê. Berê xwe da goristana ku jê re hatî bû gotin. Lê du gav pêş de û gavek şûnde dihavêt. Heta ku jê dihat, gavên xwe fere diavêt. Dixwest ku demekê zûtir ji vî tirs û xofê bifilite. Xwe bi hiş û dilekî wusa gihand ber wê gora ku gotibûn. Li ber bersalê gorê rûnişt, hêdika sing û mîrkute xwe danî ber xwe. Bêdengiyê jî xwe berda bû ser tariya şevê û dor lê girantir bû bû. Pepûkan jî di qurmên daran de ne dixwendin ku bêdengiyê pê re li hev par bike.

Zûzûka sing serjêrî erdê kir û bi mîrkut lê xist. Her çiqas axa goristanê û kutana sing asan bû jî, di her lédana mîrkut de, mîna ku di serdilê xwe de bikute, ewqas pê dijwar dihat.

DI GIRTÎGEHA DIYARBEKRÊ DE II

KELEŞ

Pişt hatina mufreza komando, di girtîgehê de, zor dan girtiya ku marşa ji ber bikin, bi awakî leşkerî bimeşin. Meşa leşkerî ku dixwestin girtî bînin cîh, ji sê qonaxa pêk dihat: Ecemetî, hostatî û komandoyî. Di vî warî de girtî, xwedî tu deng û biryar nebûn. Her tişt li gor dilê Leşkera bû. Yekî ku tişteke bigota, an êtraz bikira, lê dixistin û êşkence dikirin. Pişt vê, mirov ya dîmir an jî seqet dima. Hîn kirina wan ne bi xwestina girtiyên bû. Bi hukmê zor û zordestiyê em hîn kirin.

Dema wan xwest di girtîgehê de dest bi meş û xwendina marşa bikin, em hemû girtî li hember wan derketin û xwestina wan ne anî cîh. Ji bo vê yekê nema hiştin qowûş bi hev re bide û bistîne, her qowûşek bi serê xwe ma û girtiya nema karîbû ji hev alîkarî bistîne. Tenêbûna qowûşa karûbarê komando pir rehet dikir. Her 40-50 komandoyên ji bo lîxistinê hazir bûn diketin qowûşekê û hemû girtî derdixistin derve û tedayên xwe yê hov û bêperwa dikirin. Ji hemû girtiyên re digotin: "yan hûn ê hînî meşiya û marşa bibin, yan jî emê wê we hemûya di vir de bikujin". Ev serhildana girtiyên çen roj dom kir û hêdî hêdî piraniya girtiya meş û xwendina marşan qebûl kir. Geleka jî serî dananîn, marş û meş qebûl nekirin. Wan birin

